

## **Gießen wê bê naziyan bimînê- Çalakiya naziyan blocke bikin**

Di 16ê Tirmeha 2011an de NPDya li eyaleta Heşenê dixwazê bi Ciwanên Demokratên Neteweyî (JN) bi piştgiriya „Freie Kräfte-Hêzên Azad“ re bi şiyara „sîstem gihiştîye dawiyê-emê guherînê bînin“ çalakiyekê li Gießenê lidarbixe. Emê bi meşên kitleyî vê meşê asteng bikin.

Ji salan ve NPD dixwazê li Gießenê bingeheke xwe ava bike. Bi organizekirina çalakiyê ya bi hevkarîya „Freie Kräfte – Hêzên Azad“ NPD dixwazê strukturên xwe yê herêmî bihêz bike û ji nû ve organîze bike. Tenê pêkhatina çalakiyekê wê ji bo NPD serketineke mezin be. Hewldanan wan a ji bo meşeke mezin a li Gießenê beriya 40 salî bû û di Cotmeha 1971ê de ev meş ji aliyê şênîyê Gießenê yê wêrek ve hate astengkirin. Ji hingê ve ti kommen Neonaziyan hew karîbûn li herêma bajarê Gießenê çalakiyekên xwe beyî ku werin astengkirin, lidarbixin. Ji mînaka Wetzlerê em dikarin fêhm bikin bê çalakiyen neonaziyan ên serketî dikarin bandorên bi çî awayî bikin: Di Cotmeha 2008an de nêzî 350 Neonazî gişt bê astengî meşiyên. Piştî vê çalakiya serketî ya neonaziyan li hindûr û derdora Wetzlerê rastgir gelekî bihêz bûn. Hin beşdarên ciwan, ên di vê çalakiyê de cara yekem xwe nîşan dan, di Adara 2010an de hewl dan ku mala keşeyekî bişewitînin yê li Wetzlerê di „Yekitiya li dijî Naziyan“ de cih digre.

Wekî din em bi giştî bawer dikin, ku komên rastgir ên ekstrem û îdelojiya wan a mirovan biçuk dixê, divê di raya giştî de cih negrin û ev yek were astengkirin. Meşên rastgirên ekstrêm em weke erîşeke li dijî azadiyê û erîşeke li canê mirovan dinirxînin.

Weke ku li bajarên din pêk hat, em jî li Gießenê dixwazînin meşa naziyan protesto bikin û bi kitleyên mezin derkevin kolanan. Li Friedberg û Dresden hat xuyakirin ku meşên rastgirên ekstrêm bi riya kitleyan dikarê were astengkirin. Ji bo astengkirineke serketî raperîna sîvîl û beşdariya Gießeniyên wêrek pêwîst e. Ji ber wê em bang li hemû şênîyên Gießenê dikin ku tevî çalakiya astengkirinê ya bêşîdet bibin, bi vî awayî nîşanî neonaziyan bikin ku awayê nerîna wan li derveyî ramaneke were qebûlkirin e.

Em piştgiriye didin yekitiya „Gießen bleibt bunt – Gießen wê rengên xwe biparêze“ û piştgiriye didin hemû aliyên ku heman armanca astengkirina meşa neonaziyan parve dikin. Em dixwazînin yekîtiyeke dorfereh a bi gelek kom, organizasyon û şexsan ava bikin.

### **Lihevkirina yekitiya Giessenê wê bê nazî bimîne:**

- Emê raperîna sîvîl li dijî meşa neonaziyan pêk bînin.
- Ji aliyê me wê eskalasyonê pêk neyê.
- Em hemû yê dixwazînin meşa neonaziyan asteng bikin, piştgiriye didin hev